 Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)

 wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

# Tîrêjên Çarşembê

## Xelek - 36

# Rahên Gelê Sûbarî - Aşûrî

## Du têgînên dîrokî:

Berî ku em têkevin nava mijarê, em dixwazin van herdu têgînên jêrîn şîrove bikin, ji ber ku peywendiyeka wan a kîp bi vê mijarê ra heye:

**- Neteweyên samî**: Ev nav ji bo gelên ku koka wan biyabanî ye tê gotin. Hên li dor sala 2500 b.z. van gelan pêl bi pêl ji herêmên bakurê Nîvgirava Erebî (Cezîra Erebî) û beriya Îraq û Sûriyayê koç kir, û berê xwe dan Mêzopotamiya (Îraq) û herêmên rojhilatê Derya Sipî (Sûriya, Libnan, Filestîn û Urdin). Hin dîroknasên Ereban yên nû nav li van gelan dikin (Cezîrî) li gor (Cezîra Erebî). Yên here navdar ji van gelan evin: *Akkadî, Amûriyên Rojavayî (Ken'anî, Fîniqî), Amûriyên Rojhilatî (Babilî tevî Aşûriyan) û Aramî tevî Keldanan*.

Divêt em bêjin ku têgîna "*Nijadên Samî*" (*Semitic Race*) ji Tewratê hatiye wergirtin. Di dema xwe da, Cihûyan gelên cîhanê yên wê demê vegerandine ser sê kurên pêximber Nûh (*Sam, Ĥam, Yafês*). Kesê yekem ku ev nav bi karaniye di sala 1781-an da, zaniyarê nemsawî August Ludwig Schloetzer bû[1].

Ji bo vê beşkirina nijadî ti bingeheka rastîn nîne. Nivîskarên Tewratê ev tişt li gor berjewendiyên xwe yên geo-siyasî yên wê demê ji ber xwe afirandine. Wek nimûne, wan *Îlamiyên zagrosî* xistine nav *senseleta Sam*, û *Ken'anî û Fînîqiyên samî* xistine nav *senseleta Ĥam*. Di Tewratê da hatiye ku piştî rizgarbûna pêximber *Nûh* û yên li gel wî ji *Tofanê*, rezek (baxek) çandiye, ava tirî vexwariye û sermest ketiye (serxweş bûye), di bin konê xwe da xwe tazî kiriye. Kurê wî *Ken'an* şerma bavê xwe dîtiye û birayên xwe *Sam* û *Yafês* agahdar kirine. Ev herdu çûne ku şerma (عَوْرَة) bavê xwe bisitirînin, bêyî ku lê temaşe bikin. {**Piştî ku Nûh hatiye ser hişê xwe, zaniye ku kurê wî yê biçûk ew riswa kiriye, û gotiye: "Na'let li Ken'an! Koleyê koleyan ji birayên xwe ra be**"} û spasiya herdu kurên xwe yên din kiriye[2].



(Erdnîgariya belavbûna gelên biyabanê)

- **Neteweyên zagrosî**: Ev nav ji bo êlên ku li çiyayên Zagros û derdorên wî dijiyan dihate gotin. Hin dîroknasan ji wan ra gotiye "*Asiyawî / Asiyanî*" û hinekan jî gotiye "*Hindo-Ewropayî*". Beşekî sêhem jî ji wan ra dibêjin "*Qoqazî / Gefqasî*". Piraniya dîroknasên vî beşê sêhem ji alîgirên dibistana dîrokî ya Rûsiyayê ne. Ji wan ra girîng bû ku koka van gelan vegerînin ser herêmên Qefqasan ku di dema xwe da di çarçewa *Yeketiya Sovyetan* da bûn. Divêt em bêjin ku hên di dema qeyserê Rûsiya "*Çar Botrûsê Mezin*" (1672 - 1725) da, Rûsiya dixwast kelija xwe bide ser herêma Qefqasê û piştî wê di Kurdistanê ra berfireh bibe û bigihîne Kendava Sûmerî (farisî).

Navdartirîn gelên Zagros evin: *Sûmerî* (me berê gotiye ku di bingehê da ew ji çiyayên Zagros hatine başûrê Mêzopotamiya). *Sûbarî* û *Îlamî* (ew jî ji çiyayên Zagros daketine deştên Îlam / Xozistan) û *Gotî* (*Cûtî / Cûdî*), *Lolobî, Kaşşî* (*Kassî / Kasît*), *Horî (Khorî /Hûrî)* tevî *Mîttanî* û *Xaldî* (*Ûrartûyî*), *Menaî* û *Mîdiyan*.



(Erdnîgariya belavbûna gelên zagrosî)

## Geřek di kûraniya dîrokê da:

Di nav xwandina min da li ser dîroka kurdî ya kevin û nû, min naskir ku Kurd û Aşûrî du gelên li tenîşta hevin, û ku Aşûriyan hên ji destpêka sedsala yekem z. da dest bi wergirtina ayîna Kirîstiyanî kiriye. Kurd jî ji destpêka nîvê sedsala heftan ya z. da neçar bûne ku Îslametiyê wergirin. Û min dizanî ku cudahiyên ayînî û siyaseta Faris û Turkan hin caran ev herdu gelên cîran kişandine nava şer û pevçûnan.


Lê belê, çar tiştan bala min kişandiye ku Aşûrî û Kurd di wan da dişibihin hev, ew jî evin:

- Cejna "*Akîtu*" ya aşûrî û *Çarşemba Sor* ya kurdî-êzîdî.
- Sembola Xweda "*Aşûr*" û sembola Xweda "*Ahûra-Mezda*".
- Hin cil û berg û mûzîka torevanî (mûzîka gelêrî kevin).
- Hin taybetmendiyên sîma û laşê mirovên herdu gelan.

Piştî lêkolînên berfireh di jêderên dîrokî da hate xuyakirin ku kok û bingeha van tiştên hevbeş vedigere kûraniya dîrokê. Emê li jêr hin tiştên ku di van jêderan da hatiye, bînin ziman. Ev tişt ji gotinên dîrokzanên ewropayî û Ereb hatine wergirtin, û ne ji tiştên ku dîrokzanên Kurd gotine.

- Hary Sags "**Ne raste ku hoz û êlên Aşûriyan ji yek bavikî hatine**"[3].
- Hary Sags: "**Aşûrî gelekî têkil bû û ew vê rastiyê dizanin. Zelalbûna nijadî ji bo wan ne girîng bû. Hên ji berê da, dîroka wan a nijadî têkil bû.... ev tişt pir caran di nexşên padîşahî da hatiye gotin**"[4].
- Hary Sags: "**Di hezarsala duwem b.z. da pêleka xurt ji Horiyan hate herêmê, yê ku bandoreka hemdemî di çanda aşûrî da hişt**"[5].

- Tewfiq Suleyman: "**Wêne û nexşên ku Aşûriyan li ser kesayetiyên xwe hiştine didin xuyakirin ku ew ji çavkaniyên mirovî têkil yên herêma Mêzopotamiya û çavkaniyên mirovî yên ku bi koka xwe vedigerin erdê Ermîniya pêkdihatin**"[6].




Di rastiyê da gotina "*erdê Ermîniya*" ne gotineka bi temamî duriste. Pêş sedsala 7-an b.z. ew welatê ku niha jêra "*Ermîniya*" dibêjin, jêra digotin "*Ûrartû*" û "*welatê Xeldî*" û gelê *Ûrartû / Xeldî* ji neviyên gelê *Horî* ye. Gelê *Hai* ji Belkanan koç kiriye û di dawiya sedsala heftan b.z. da gihîştiye *Ûrartû*. Farisan nav li wan kir "*Ermen*" û navê welat jî kirin "*Ermîniya*". Mixabin ku piraniya dîroknasên Ereb û ewropayî navên cih û waran li gor navên nû dibêjin. Di rastiyê da divêt li gor dema ku bûyerên dîrokî qewimîne bêne gotin û ne li gor navên pêkhatên siyasî û rêveberî yên ku paşê hatine xuyakirin.

- Li welatê *Sûbartû* (ku paşê navê xwe bû "*welatê Aşûr*") perestgehek ji bo xwedayê sûbarî yê gewre "*A- Owsar*" hebû. Ev nav di koka xwe da navekî *sûbarî* ye û ne *akkadî* ye. Dîroknasan wateya vî navî nedizanîn, ji ber ku zimanê *sûbarî* piştî desthiltdariya *amûrî* li ser *Sûbartû* wenda bû. Peyvên vî zimanî tenha di hin navên serdarên *Sûbariyên* pêşîn da mane. Avakerê vê perestgehê serdarê *sûbarî* yê bi navê "*Ushpia*" (*Ûşpiya*) bûye. Wî ev perestgeh li ser bingeha perestgeheka *sûmerî* kevin avakiribû ku bi taybet ji bo perestina xwedawenda *sûmerî* "*Innana*" (bi *akkadî*: *Eştar*) bû[7].
- Ev xwedawendê *sûbarî* "*A- Owsar*" ewe yê ku navê wî bi tîpên mîxî *akkadî* bi şêwazê "*Aşûr*" hatiye nivîsandin. Yanê tîpa "s" hatiye guhartin û bûye "ş"; wek (*Sûmer* = *Şûmer*, *Sûber* = *Şûbar û Semsû* = *Şemşû* û hwd.). Welatê *Aşûr* di jêderên mîxî da bi navê "*mat Aşûr*" yanê "*welatê Aşûr*" hatiye naskirin û bi şêwazê "*A - şû - ra*" hatiye. Di jêderên misirî da, di heyama Tiĥûtmûsê Sêhem da (1490 - 1436 b.z), bi şêwazê (*Asur*) hatiye[8].
- Navê "*Aşûr*" di hin jêderan da bi şêwazê "*As-hûr", "Asşûr", "Esûr", "Athûr, "Atûr", "Asûr" û "Azûr"* hatiye[9].

Ji van tiştên ku derbas bûn, em digihînin du encaman:

1 - Ew gelê ku ji hezarsala duwem b.z. da bi navê "*Aşûrî*" hate naskirin û hên jî bi vî navî têye naskirin, ne tenha ji yek nijadî ye û ne jî ji yek çandê ye. Ew pêkhateke ku bi encama têkiliya şaxekî ji *Amûriyên* biyabanî (*samî*) li gel beşekî *Sûbariyên* zagrosî (çiyayî) peyda bûye. Hin Dîroknas *Sûbaran* dixin nav *Horiyan*.

2 - Navê "*Aşûr*" di bingehê da ji navê xwedawendê *sûbarî* "*A- Owsar*" hatiye wergirtin ku paşê ev nav bi *akkadî* bûye "*Aşûr*". Piştî desthilatdariya *Amûriyên* biyabanî li ser *Sûbartû*, êdî ev nav ji bo xwedayê neteweyî, ji bo gel û welat hate gotin.

Emê paşê bi berfirehî şêwazên van guhartinan temam bikin.

Çarşemb, 02.12.2015

## **Jêder**

[1] Jawad Ali: Berfirehî di dîroka Ereban pêş Îslametiyê da, 1/223 - 224.
[2] Tewrat: Rêwîtiya Pêkhatinê, Eshah, ayet 24, 25.
[3] Hary Sags: Mezinahiya Aşûr, rûpel 170
[4] Hary Sags: Mezinahiya Aşûr, rûpel 173.
[5] Hary Sags: Mezinahiya Aşûr, rûpel 174.
[6] Tewfiq Suleyman: Lêkolîn di şaristaniyên rojavayê Asiyayê ya kevin da, rûpel 161.
[7] Amer Hanna Fetûhi: Keldan ji destpêka zeman, rûpel 93
[8] Muhammad Beyyûmi Mehran: Dîroka Îraqê ya kevin, rûpel 324.
[9] Hary Sags: Mezinahiya Aşûr, rûpel 11. Ebdulhamid Zayed: Rojhilata Hemdem, rûpel 434.